

## EYŞÊ, TU EYŞÊBÎ...

Eyşê yeke zimane, şerûd bû. Gundda kesek nemabû, ku pêra şer nekiribûya. Te hew dinihêrî sibê şebêqê derdikete derva, menîk cînarekê digirt û pêra dikire şer. Hetanî nekira şer, dilê wê rehet nedibû. Lema jî cînara, gundya derê wê venedikirin.

Lê ew çendek bû dengê Eyşê îdî nedihat. Gundî ser vê yekê ecêbmayî diman:

- Xwedê hevîne, ev çi qewimye, wekî dengê Eyşê naê, cînarara nake şer? – gundya digotin.

Wê rojê Kino mera wî ser mila hat berbi serê bendê here. Rya wî binatara mala Eyşê diket. Gava hat nêzîkî tanga mala Eyşê bû, ew ji hundur derket, ber dêrî sekinî, Kino kire gazî:

- Kino, Kino, bidî xatirê Xwedê, were ber derê me! Ezê tera tiştêkî bêjim.

Kino fikirî, wekî Eyşê qestîka gazî dike, ku pêra têke şer.

- Eyşê, ezî lezim, av diçe ser bostanê me, ez gerekê herim lê bibim xweyî, - Kino gotê.

- Na, na! Bidî xatirê Xwedê, tê bêyî. Gilîkî minî ferz heye tera bêjim.

- Eyşê, dive kirê şer hatye te, dixwezî minra têkî şer?

- Na, xwe ez dîn nebûme tera têkme şer! Te çi kirye, wekî tera têkim şer?

Her tenê gilîkî min heye tera bêjim.

Kino têderxist, wekî nikare gura Eyşê neke, neçe ber derê wê. Mer ser mila çû ber derê Eyşê.

- Wey tu ser ç'evara hatî! Were kêleka xûşka xwe rûnê, - Eyşê gotê.

Kino tex'mîn kir, wekî tiştêkî xirab fikra wêda tune, mera xwe danî, çû kêlekê rûnişt.

- Kino, bidî xatirê Xwedê, tê minra têr bidî ç'êra, - Eyşê gotê.

- Pî, Eyşê, xwe tu rya Xwedê neketî? Ezê çira tera bidme ç'êra? – Kino bi ecêbmayî jê pirsî.

- Hergê tu Xwedê dihebînî, tê minra bidî ç'êra. Tu nedî ç'êra, ezê yeke usa bînim serê te, wekî om-om bê gilîkirinê, - Eyşê bi hêrs gotê û ç'evê xwe lê cinû kir.

Kino nizanibû çi bikra. Zanibû Eyşê dikare hertiştî bike, wê nikaribe yaxa xwe jê xilazke.

- Hela minra bêje, seva çi tera bidme ç'êra, - Kino dîsa jê pirsî.

- Tu bide ç'êra, ezê paşê tera bêjim, - Eyşê caba wî da.

- De wekî usane... - Kino ç'evê xwe girt, devê xwe vekir, çiqas ç'êr-i'tî zanibûn, gişt dane rêzê...

Çiqas diçû, beşera Eyšê xweş dibû. Tê bêjî ew çî ku Kino digotê, bi dilê wê bû, pê baristan dibû.

Wexta Kino rind da ç'êra, Eyšê bi beşereke xweş berê xwe wîda kir û dubare caba wî da... Gava hertişt gotê, dilê xwe rehet kir, hevekî xwe kerkir, bîna xwe stend, hilda dawîêda ha gotê:

- Rehme bavê tebe... Of, dilê min teze rehet bû.

Û Eyšê gotê, wekî çawa kurê wê Xalit çendekî pêşda jêra gotye, hergê virhada ew cînarara bike şer, wê milê wê bigre ji malê derxe, bêxweyke. Gotî te em nava gundada kirine oyîn-sosret. Te usa kirye kesek derê me venake. Bese, bese, bese... A tirsê vê yekê bû, wekî Eyšê ew çendek bû cînarara şer nedikir. Lê nikaribû ber xwe bide, lema gazî Kino kirye û usa kir.

- Zulma ha jî dibe? – Kino ber xweda got, rabû jê dûrket.

Paşî vê yekê dengê şerê Eyšê îdî gundda kêr dihate bihîstine.